

## Ji Edîtoran

Em kêfxweş in ku bi hejmara xwe ya duyem ya kovara Folklor û Zimanê li pêşberî we ne. Folklor û Ziman ku di bin banê Weqfa Mezopotamyayê da, salê du caran (nîsan û çirîya pêşîn) derdikeve û kovareka bihekem û navneteweyî ye. Di kovarê da xebatên akademîk yê li ser folklor û zimanê kurdî cih digirin. Zimanê gotaran, ji bilî kurteyên îngilîzî, bi temamî kurdî ye.

Di çerçoveya folkora kurdî da mijarên wekî teorîyên folklorê, edebîyata gelêrî, adet û tore, bîr û bawerîyên gelêrî, zanyarîyên gelêrî, ferhenga herêmi, têgehên folklorê kurdî, xebatên meydanî û herweha lêkolîn û nivîsên derbarê etnografyaya kurdî da û hwd dihên weşandin. Di çerçoveya xebatên zimanî da jî dê her cure mijarên têkildarî fonolojî, morfolojî, sentaks, morfosentaks, zimannasîya civakî (sosyo-linguîstîk), zimanzanîya îranî hwd cih bigirin. Di kovarê da dê nivîsên di forma gotar, werger, danasîna sempozyum, pirtûk û tezan da jî biweşin.

Di vê hejmara me ya duyem da neh gotarên zanistî yê li ser folklor û zimanê kurdî hene. Em dikarin bi kurtî wan weha vebêjin:

Akademîsyen Hikmettin Atli di gotara xwe ya bi navê *“Tesewirên Nasnameyî yê Kurdên Elewî û Êzîdî di Pêwendîya Vegotinên Gelêrî da”* bi berfirehî li ser têgihîştina kurdên elewî û êzîdî ya nasnameyî sekinîye û bi rêya rengvedanên wê yekê yê di vegotinên gelêrî da analîz kirîye.

Sinan Gultekin di çerçoveya rêzimana nûjen da, gotara xwe ya bi navê *“Hevreferansîya Bikeran di Hevokên Aloz da”* pêşkêş kirîye ku bi berfirehî û bi datayên çendînî, li ser stratejîyên jêçûn û jêbirina bikerên hevreferans sekinîye.

Lêkoler Aram Roder di çerçoveya xebatên folklorê da, di gotara xwe da ku bi navê *“Hêmayên Homoseksuel û Karakterên Queer di Destana Memê Alanî da”* ye, li ser destana Memê Alanî sekinîye û di çerçoveya teorîya Queerê da û bi bingeheka teorîk ya xurt û xwendinên hêja, analîzên balkêş li ser karakterên vê destanê kirine.

Veysel Yildizhan di gotara xwe da ku bi navê *“Destpêkêk Derheqê Kokê Ziwanî de”* ye û bi diyalekta kirmanckî nivîsîye, li ser perspektîfên peydabûna zimanî sekinîye û bi îstîfadekirina ji gelek xebatên teorîk tabloyeka giştî pêşkêş kirîye.

Lêkoler Ferhat Kaplan di gotara xwe da ku bi navê “*Nav û Cureyên Sewalan (Ajelan) û Çanda Sewalvanîyê li Devera Qerejdaxa Wêranşarê*” ye û encama xebateka meydanî ye, hem li ser çanda sewalvanîyê hem jî li ser termên wê çandê xebateka hêja kirîye.

Mehdi Jafarzadeh lêkorekî bi eslê xwe ji herêma Xoresanê ye, di gotara xwe da ku bi navê “*Berawirdeka Dengnasî di Navbera Kurmancîya Xorasanê û Kurmancîya Bakurî da*” ye, li ser berawirdkirina fonolojîk ya kurmancîya Xoresanê û ya standard (bakurî) sekinîye û taybetî li ser guherîna dengdêr û dengnedêran gelek nimûne pêşkêş kirine.

Akademîsyen Umran Altinkiliç di gotara xwe da ku bi navê “*Xuyang û Forma Rêzimanî ya Rewşan di Kurmancîyê da*” ye li ser xuyanga rêzimanî ya cureyên lêkeran sekinîye û bi gelek mînakên rewşa wan ya semantîk nîqaş kirîye.

Bahiez Omar Ahmed jî di gotara xwe da ku bi navê “*Rêzbûna Dîyarkerên Piştî Sereyî di Girêya Navî ya Govera Behdîni ya Zimanê Kurdî da*” ye li ser modîfîyekerên paşnavdêrî û rêzbûna wan sekinîye û li gor devoka behdîni ew analîz kirine.

Akademîsyen Mikail Bulbul û Mustafa Ozturk di gotara xwe da ku bi navê “*Nîrxandina Destxeta Mela Mehmûdê Bazîdî Kêşana Lêkerên Kurdî*” ye, li ser destxeta Mela Mehmûdê Bazîdî ya 1866an sekinîne û hem zimanê Bazîdî hem jî naveroka berhema wî analîz kirine.

Di beşa nasandina pirtûkan da jî du pirtûkên hêja hene. Yek jê ya Munzur Çemî (Veng û Hesreta Herdê Dewrêşî) ye ku bi kurdîya kirmanckî hatîye nivîsîn û Ugur Sermîyan nasandina wê kirîye. Ya din jî ya akademîsyen Necat Keskin e ku bi navê “*Folklor û Edebîyata Gelêrî*” ye û Mustafa Aslan nasandina wê kirîye.

**Edîtor**

**Mustafa Aslan, Mikail Bûlbûl**